Derbarê vîrusa koronayê ya vê dawiyê

Ev agahdarî ji bo te ne yê ku vê dawiyê ji welatekî yan cihekî hatiye ku vîrusa koronayê ya vê dawiyê lê belav bûye.

Divê tu çi bikî?

Heger tu di van 14 rojên dawiyê de li cihekî yan welatekî mabî ku vîrusa koronayê lê belav dibe:

- Heger nîşaneka nexweşiyê ya organên nefesê, wek kuxîn, tengenfesî yan ta û laşgermî li ba te peyda bibe – ji bo şîretên tibî bi zimanê swêdî û îngilîzî telefonî 1177 Vårdguiden (nimreya telefonê 1177) bike.

Weha xwe û kesên din biparêze

- Di veşkandeka/qurmîçoka milî de bikuxe û bipişike/bibihnije.
- Destên xwe bi av û sabûnê bişo.

Pirsên te hene?

Li agahdariyên herî dawiyê û bersivên pirsên ku bi piranî tên kirin binêre www.folkhalsomyndigheten.se/nyacoronavirus

Derbarê nexweşiya covid-19

Ji meha duzdehê ya sala 2019-ê ve, vîruseka nû li Çînê belav dibe. Navê covid-19 li nexweşiya ku ev vîrus peyda dike hatiye kirin. Nexweşbûna piraniya kesan sivik e, lê hin kes tûşî nexweşiyeka girantir wek îltîhaba pişikan/sihan dibin. Vûrus bi rêya temasa laşê kesekê nexweş yan bi rêya peşikên kuxîn yan pişikîna wî kesî diçe kesên din. Îhtîmala ku tu jî bi vîrusa koronayê ya vê dawiyê nexweş bikevî zêdetir e heger tu li cihekî yan welatekî mabî ku ev nexweşê lê belav dibe yan jî tu ji nêzîk ve bi kesekî re mabî ku hilgirê vê nexweşiyê ye.

covid-19 information resenärer kumanji 2020-02-27